

OROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



1985
9

NAVEROK

Jî Xwendevanan	3
40 Saliya Hêzên Pêşverû Lî Diji Faşizmê	4
Komevina KOMKAR'ê ya 7'an Pêkhat	9
Bî E. Clason ra Hevpeyvin	11
Şêrê Mê	13
Leca Helbest û Serpêhatiyan Bî Navê	
Ehmedê Xanê	15
60 Saliya Serhildana ŞÊX SEÎD	16
Sukerman û Xebatêni wi yên Kurdzaniyê	21
Jî Helbestêni Elmani	22
Gırık	23
Jî Folklorâ Kurdi	25
Gotinêni Pêşiyân	27
Film	28
Pêkenin	29
Jî Nav Weşanan	30

Sal : 7
Hêjmar : 52

XWEDİ : KOMKAR - Swêd
BERPIRSIYAR : Rohat
NAVNIŞAN : Karlbergsu. 32 B. nb
113 27 Stockholm
TELEFON : 08 / 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen
ANSVARIG UTGIVARE : Rohat
ADRESS : Karlbergsu. 32 B nb
113 27 Stockholm
TELEFON : 08 / 32 82 51
PG : 458980 - 0

WELATÊ MIN

AZADI

Tu çîma dînali ?
 Nalina te
 Xweş tê guhê me
 Nalinek kûr
 Jî bîrinan
 Xem û derdan
 Dî zindanan
 Bîn hngêñ dijmînan
 Çavşoran
 Xwinmijan
 Mêrkujan
 Stemkaran
 Segan....
 Tevda bûne xwin
 Deşt û zozan
 Ava golan
 Tevli Kaniyan
 Qotê çiyan...
 Dînali, dîkeli, dîşewiti...!
 Bî destê hovan
 Koledaran
 Mafxwiran
 Bî destê keran...
 Talan bûye...
 Mafê mirovan
 Keda gundiyan
 Karkeran
 Belangazan...
 Hejar kîrin wan
 Zarokêñ dergûşan
 Tevli diyan
 Bûkêñ kozan...
 Kuştin.. binax kîrin..
 Xortêñ cîwên
 Jî menalan
 Jin û piran...
 Têrnebûn ew... her birçi man
 Man dev bî xwin
 Man dil bî kin
 Lî tîrsîyan...
 Jî şervanan
 Pêşmergeyan
 Qehremanan
 Şoreşvanan
 Têgîhiştin ko şin dîbe
 Xwine nemiran
 Rengin dîke
 Kakê Kurdistan
 Bilind dîbe dengê
 Azadixwazan...

Te bidim jiyandin!
Tu ku
Sinorêñ çar zeviyan
Dî hati
Lêxistin û girêdan
Tu ku ji aliyê
Çar hovanva
Hati bindest kîrin
Tu berdan
Nav daristanan
Û xwina te mêtin
Û hati zêrandin û pelçiqandin

Tu xistin
Nav reşîya tarîyan
Û tu kîrin mêtîngeh
Eu can bo çi dîsekine ?
Jî bo te !
Ku dest bî serhildanan nekim
Ku ala rengin
Venckim
Lî çiyyayêñ Kurdistanê
Ku zindanan nezvirinim
Dabistanan û jiyanê
Mora xayintiyê lî min xe!
Serhildanana Kurdistanâna hêsirim.
Serhildan im
Serhildana azadi û aşitîyê me.

Gelek silavê germi û şoreşvani jî ber-pîsyar û xwendevanê Roja Nû ra.

Heval û bîrayê we MARUF

PÊKENİK

Parsekek (cevindok) rojekê dîce ber deriyê dewlemendeki gelek nexwêş.

Gava dewlemed, jî qata jorin parsek dibine, gazi xulamê xwe dîke û jê ra dibêje:

— Kuro here bêje Eyşê , bîra ew jî, jî Fatê ra bêje, Fatê ji bîra jî Nexşê ra bêje bîla Nexşê jî here devê dêri, jî parsek ra bêje "Xwêdê bîde te".

Gava parsek van giliyan dîbihise, des-tê xwe radike û nifran dîke:

— Xwedêyo, jî Cebraîl ra bêje, bîra ew jî Mikail ra bêje, Mikail ji, jî Israfil ra bêje Israfil ji bîra xeberekê bîde Ezrail ku Ezrail bê canê vi merivi bistine.

40 SALIYA SERKETINA HÊZÊN



EV
SER
NAYÊ
BIRKIRIN

ROHAT

* Viladimir ev du sal bû li bajarê Berlinê bû, dergistiya wi Nataşa li Moskovayê birinên nexwaşan dipêçand. Ev du sal bu, wan hev neditibû. Ne Viladimir dizanibû Nataşa li kuye ne ji, Nataşayê zanibû Viladimir li kuye. Zarokên wan çi dikirin li Leningradê, li bal kê bûn gelo, kesi nizanibû, Eva şer bû, erd hejiya bû, kevir li ser kevira ne mabû.

* Vanya hêviya nameyêن mêtê xwe bû, her roj riya postevan dipa weki nameyekê ji eni yêbihata, lê tiştek nedihat. Vanyayê nizanibû mêtê wê, di şerê Stalingradê da hatiye kuştinê. Vanya hertim radiyo guhdar dikir, weki ev şerê kingê biqete û mêtê xwe gaveke pêşa bitita. Lê şer ne diqediya, dajot, dicû.

* Cobot 6 sali û İlya 7 sali bû, bavê wan di şer da hatibû kuştinê, wan hertim dipirsi "Dayê bavê me, wê kingê bê". Bersiva dayikê hertim hazır bê "Kingê şer qediya, bavê we nasekine wê bê". Şer qediya û sal derbaz bûn, tu kesek ji eniyê venegeriya.

* Lê gelo Mariyayê çi dikir, hem herdu law, hem mêtê wê di şer da hatibûn kuştinê. Rebenê, ev yek zanibû, xwe ji 60 sali bû, tek-tenê mabû. Wê hertim gore, lepik çêdikirin. Ü dibir teslimi berpirsiyaran dikir. Ji kê ra dışand Mariyayê ev gore û lepik, wê ji nizanibû.

* Anton ji aliyê Hitlervanan da hat birindarkirin. Bo dijmin wi nebinin, ew berbi daristaneke piçük reviya, li wir xwe weşart. Lê xuna wi, wêk avê ji birinên wi dikişiya, wê zanibû ewê, ji ber vê zêde xun undakirinê bimire. Ji berika xwe kaxizeki spi derxist û nivisi "Navê min Anton Leonove, ez ji bajarê Moskovayê têm, navê jina min Yuliya ye..." nama xwe neqedand û cida sar bû, nişkêva kete erdê. Kes li doberê wi tune bû, tenê darêñ hêşin û ezmanên şin Anton dititin.

* Pavel, ev nêzkaya salekê bû, ji jina xwe Olyayê tu namek nikaribû bistenda. Rojekê rûnuşt nameke dûr û dirêj disa nivisi şande Moskovayê. Postevan dema name belav dikirin çû nama Olyayê bidê, dit weki ew kuçe bi hemû xaniyan va hatiye hilweşandinê û ew edreşa tunebû. Postevan anî carke din ev nama şunda şand û li ser pişta name nivisi "Ew adrêsa ku we nivisiye, li wê kuçê tu mal xani ne mane, 1-8-1942, Moskova".

* Xatiya Emine, jineke Kurd bû, mêtê wê Edo di şer da hatibû kuştinê, kurê wê Ahmed ji, di bist dusaliya xwe da çûbû şer, ev du salê wi bûn, tu deng-bchs jê derneketibûn. Xatiya Emine, ji sibê heta êvarê, ji êvarê heta sibê dilorand, şin û giriye wê qet xelas ne dibû. Tenê distira û ber dilê xwe da dihat. Ev bû karê wê. Rojekê disa ji xewê rabû, li derva nihêri û disa lorand:

"Lawo iro ezê rabûn bina bê tê
Min nehêri Ahmed bavo, tiving dêst da, ji cengê tê".

PÊŞVERÛ LI DIJİ FAŞİZMÊ

Hitler

Hitlerê faşist

topa dinê ser tilike xwe zivirandiye

Û Hitler bî êgir va listiye

Meriveki har, çavşor û din bûye

Çûye-hetiye, cihud şevitandîne

"Xuna cihuda min ra binin

binin

Îşev ezê serxwes bibim" gotiye

Sibetûrê Hitler li meydanekî fireti

derdikeve ser kursi

Wek dina tê-dice

Û dibêje

"Dîvî Elmanyekî mezîn hebe

h ser topa dinê

Eva heqe"

Û wextek derbaz dibe

Şerê dinêyi duwemin diteqe

Pênci milyon mirov dimre

Dî vi şeri da

Û pênci milyon dil dişewite.

Belê 50 milyon dil, 50 milyon can û 50 milyon mirov dî vi şeri da dîmirin. Dî dawiya şer da, riyâ xelasîyê nabine Hitler, ew ji xwe, bî destê xwe, xwe dikuje, mîjîyê xwe perçê-perçê dîke û bî vi tehri dest jî dintiya xwe ber dîde, gor bî gor dîbe.

Hitler tene nebû bayisê Şerê Dinêyi Duwemin, jî aliyê din, dewletên emperyalist dî nav xwe da ketübûne lecekê, dixwastin axa dinê carke din, dî nav xwe da parevekin, erdê wan têre wan ne dîkir. Alikî Elmanyâ, İtalya û japon, jî aliyê din Ingiltere, Emerika û Frense hebûn. Ev her şest dewlet bûbûne du beşan, lî pêşberi hev sekînin.

Vi şerê mezîn bî rasti 6 salan ajot, bî 2194 rojan berdewam kîr. Şer dî roja 1.9.1939'an da despêkir, dî roja 2.9.1945'an da qedîya.

Cara pêşin Elmanyê êrişî Polonê kîr, erdê vi welati xîste bin destê xwe, êdi şerê Dinêyi Duwemin despêkîribû, lî Polonê rojê 3.000 kes dihate kuştin û vê yekê 6 salan ajot.

Paşê Danimark, Norveç, Finland, Frense, Yuwnan, Bulgariya, Holland, Belçika û gelek welatên din ketin bin destê hêzên faşist. Faşistan êrişen xwe dajotin, jî aliki da hemberi welatparêz, pêşverû û kesen sosyalist, jî aliyê din da, hemberi kêmaniyê ën biyani lî van welatan, wek cihudan, şereki hisk û bêhempa hate ajotin. Piraniya van kesan bî hoviti hatin kuştin, dî "Kampê Civandinê" da can dan. Tenê dî van kampan da 11 milyon kes hatin kuştin, jî van kampan gelek lî Elmanyê hatîbûn sazkırın. Dî kampan da, gelek kes jî ber birçibûn, serma, nexwaşı, eziyet, lêdan, êşkence û êrişen mayin, hatin kuştin. Çawa tê zanin piraniya wan cihud bûn. Daxwaza nazîyan ya here mezîn ew bû, weki gelê Elman jî gelê biyani bê paqîkîrin û Elmanyâ bîbe welatê Elmanan, jî ber vê nijadperestiyê, bî hezaran biyani bûn gorîyê nazîyan.

MÊRXASIYA GELÊN SOVYET LI DIJİ ORDÎYÊN HÎTLER

Vê carê faşistan çav berdabûne welatê Sovyet, dixwastin vi welatê sosyalist ji rûbarê dînyayê rakîn, welatê pala, gundi û karkeran hîlweşinîn. Hemû faşistên dinê giraniya xwe dabûna ser vi şerê lî dijî Sovyet û dî roja 22.6.1941'an da şer despêkir. Vi şerê navbera gelên Sovyet û Elmanan 4 salan ajot. Dî navbera van 4 salan da gelên Sovyet bî mîrxasi şer kîrîn û zora faşistan birin, faşist ji welatê xwe paqîjkîrin, dî dawiyê da, dî roja 8.5.1945'an da faşist teslim bûn. Hêzên şorîşvan, ordiya sor û welatparêzên sovyet dî vi şeri da mîrxasike bêhempa nişan dan. Gelên Sovyet lî pêş û lî paş eniyê bî mal, bî can, bî mîr bî jîm, bî hemû hebûna xwe va rabûn lî ser piyan û faşist pur-poşman kîrîn. Wan dî vi şeri da 20 milyon şehit dan, tenê 3 milyon komînist endamên partiyê, dî vi şeri da canê xwe dan.

Lî welatê Sovyet 1710 bajar, 70 hezar gund, 32 hezar sazgehêن endustriyê, 100 hezar wargêñ gundiyan û 65 hezar kilometr riya hesin dî vi şeri da, ji aliye hitlervanan da hatin xîrab kîrîn, dan ber êgir û şewitandin. Ji aliki da 20 milyon kes lî welatê Sovyet hatîbû kuştin, ji aliye din aboriya welat sero-bino bîbû.

Lî hemberi van hemû dijwari û tengasiyan disa ji gelên Sovyet ser ketin, welatê xwe azat kîrîn, ne tenê welatê xwe, wusan ji, ordiya sor gelek welatên mayin ji, ji ber destê faşistan rizgar kîrîn. Dî roja 8.5.1945'an da êdi dawiyâ şer hatîbû, hemû mîrovaya cihanê ji xedara faşizmê xelas bîbûn. Ji bo gelên cihanê êdi bahar bû, faşist bin ketibûn, mîrovêñ van welatan dilşa bûn, dikenîyan, hev radimûsan. Aliye din da gelek, kes bî xemgin, bî keser û bî kovan hêviya nas û pîzmamêñ xwe bûn, weki, ji eniyê, ji meydana şer vegeerin. Lî ew nedîhatin, ew tunebûn, ew şehid ketibûn. Zarokêñ bê bav-dê mabûn, jînêñ mîrîn wan hatîbûn kuştin, dê-bavêñ zarokêñ xwe wundakîribûn, bukêñ dergîstiyêñ xwe carke din nikaribû biditina, lî welatê Sovyet bî hezaran kes, ji ber vi şerê gîran, tek-tenê mabûn, çavêñ wan lî rê bû, ha iro, ha sibê wê bahatana, lî kes nedîhat... Xemêñ wan, janêñ wan, hêvi û baweriyêñ wan, tenê tiştek hini mîrovêñ Sovyet kîribû; hêjabûna aşitiyê. Ji ber vê yekê mîrovêñ Sovyet iro gelek hewcedari aşitiyê ne, wan gelek derd û kul ditin. Ew tu wext nikarin vi şeri bir bikin.

DI NAV DENGÊ TOPANDA EDEBÎYAT

Lî Sovyetê vi şeri bê rawestan 1418 rojan ajot. Leşkerêñ Sovyet lî dema dor-girtinêñ Leningrad, Moskva û Stalingradê mîrxasiyêñ mezîn nişan dan. Lî van bajaran şer mal-mal, deri bî deri, kuçe-kuçe dajot, dijmîn û ordiya sor hemberi hev bûn. Ordiya sor tîrs-xof çiye nîzanbû, hertim êrişî dijmîn dikir. Nîviskarê Sovyet yê mezîn Konstantin Simonov dî romana xwe da bî navê "Şev û Roj" da gelek xweş lî ser mîrxasiya mîrovêñ Sovyet lî dorberê bajarê Stalingradê, dîsekîne. Simonov romanêñ bî navê "Kesêñ Dijin û Dîmrin" û "Mîrov ji diyâ xwe leşker nayê dinê" disa lî ser şerê cihanêyi duwemin dînivisine. Ji der leşkeran, wusan ji gelek nîviskarêñ Sovyet çûne lî eniyê. Ji van nîviskaran 900 kes çûye şer û ji wana 345 kes, dî nav şer da hatine kuştinê. Wek Arkadi Gaydar,

Yuri Krimov û Evgeni Petrov. Bî rasti, lı Sovyetê, paşı şer, edebiyateke nûh bejnda, naveroka vê edebiyatê bî taybeti temayên lı ser şerê Cihaneyi Duwemin, pêk ani. Şoholof, Konstantin Simonov, Mihail Svetlov, Aleksi Tolstoy, Aleksandr Fadeyev, hemû ev niviskarêñ navdar dî nav vi şeri da gihiştin, wan efrandinêñ bî nîrx û giranbihâ nivisandin.

CENGAWERÊN KURD JI TEVÎ ŞER DIBIN

*Here lawê min, oxirbe mér bi
Mina xalê xwe egit û şér bi
Ber dijmin me şurê du dev bi
Nav şerê giran mér-mérexas bi*

*Hesbê bin te da hespeki sore
Siyarê hespê fêriz û zore
Here hawê min oxirbe, mér be
Mina birê xwe egit û şér be*

*Here kurê min oxira xêrebe
Şirê dayka te, lı te helal be
Faşista qırke welat azat be
Méraniya te ra dîlê me şa be...*

Wusan digotin dayikêñ kurdêñ Sovyet, ji bo lawêñ xwe, lawêñ ku bê tirs û xof xwe davitin nav agîrê şer û dîçûne mirinê.

Wek hemû gelêñ Sovyet wusan ji lawêñ gelêñ Kurd ji, bî aktifi tevi vi şerê diji faşizmê bûne, zora-nazistan birine, birindar bûna û hatine kuştinê. Ew heta Berlinê çûne, çûne derketine lı dorberê bajarêñ Stalingradê, Moskovayê û qasi keda xwe, qasi hêzêñ xwe, lingê dijmin xistine soleke teng û derbêñ xedar lı wan xistine. Dayikêñ kurd, dê-bav û kal-piran disan dengê xwe bîlind dikirin û dîlorandin:

*De lêxin, lêxin û lêxin
Ji bo kur û keçê me lêxin
Ji bo dê û bavê me lêxin
Faşistan qırkin, dinê xilaskin.*

Kurdan, bî rasti ji lê dixistin, Semendê Siyabendov tenê bî destê xwe 15 faşistên Elman kuşt. Wi mérxaşike mezîn nişan da. Wi, ji destpêka şer he ta dawiya şer, lı eniyê lı diji dijmin tekoşin dîda. Ji ber van xebat û karan, Semendê Siyabendov bû xudanê gelek nişan û xelatan. Paşê ew hêjayi navê "Mérxaşê Yekitiya Sovyet" bû. Dereca vê xelatê gelek bîlind bû.

Wek niviskarêñ Kurd Qaçaxê Mirad, Usîvê Beko, û İ.İ. Sukerman gelek şervanêñ kurd, dî şer da besdar bûn dî nav rêsêñ Ordiya Sor da cih girtin. Me sele, Usîvê Beko, du caran bî giran hate birindarkırinê. Paşê disa vege riya hat lı ser karê xwe.

Maraşalê Sovyet û serek qumandarê navdar H.K. Bagramyan, dî nav biraninên xwe da lî ser mîrxasiya Kurdan dîsekine û dîbêje "... Kurda ji çawa gelên bîra yên mayin xwe nişan dan, çawa welathezên Sovyetê yên dîl bî şewat. Hemû şervanên Sovyetê bî netewê xwe va Kurd, ku lî min ra hev hatiye tevi wana lî pêş eniyê şer bîkîm, deynê xwe yê leşkeriyê bî hêjayî dîqe-dandin".

Disa, Nado Maxmudov dema lî ser Şerê Cihaneyi Duwemin dîsekine, ew dî nav biraninên xwe da geleki besnê jînên Kurd dîde. Lî paş eniyê wana çawa cedandiye, wêki xurek, gore, lepik û tiştên mayin amade kîn û bîşinin jî bo leşkeran lî eniyê. Gelek jinan zêr, ziv û xîşirêñ xwe pêşkeşi serketina şer dikirin. Nado Maxmudov bî taybeti navê jîneke kurd dîde; Naza Eşo. Di biranineke din da ji, N.Maxmudov wusan dîbêje: " Wê demê jîneke kurd bî wergertina netewi, bî dêmê li ber rojê qimili boxçek bin mil da, hatec hundur. Ewê bî makulî silav da besdaran, paşê nê-ziki texte bû, boxçe vekir û 15 cot gorê nexş ji nav derxistun û dani lî ser texte. Ew gore ci-hêzê keça - Zinê bûn. Dergistiyê wê Tital, dî şerê bona Stalingradê da bî nêrxasi hatibû kuştinê. Dê û bava bîyîr girtibûn, weki wan gora ji leşkerê pêş eniyê ra bîşinin. Paşê ew jîn ve-geriya, destê xwe hilparkiri ezman kîr û got:

— Xwedê, belki, tu mirazê Hitlerê kuçîk çavê wi da bîhêli, çawa ewi mirazê Zinê û Titalê min, çava da hîstîn.




Cimoyê EYO



Salimê ABAS




Semend SIYAMENDOF



Teyro SULTANOFOF

KOMCIVINA KOMKAR'Ê YA 7'AN



Komcivina 7'an a Federasyona Komelêن Karkerêن Kurdistan Lı Elmaniya Federal û Berlîna Rojava (KOMKAR) dı rojêن 18-19 meha Gulanê da lı bajarê Kolnê pêkhat.

Dı komcivinê da, tevi nûnerên 22 komele û komiteyên ku girêdayî KOMKAR'ın, gelek mîvan, nûnerên parti û rêxistinêن dêmokrat, rojnamevan ji hébûn. Salona komcivinê bî endam û dostêن federasyonê, bî jin û mîr tije bîbû. Gelek parti, rêxistin û kesên dêmokrat sîlavname şandibûn bo komcivinê.

Piştî xeberdana serokê federasyonê rapora kar û bar hate xwendin û piştî vê ji dor hate axaftina mîvanan. Nûnerên gelek parti û rêxistinêن dêmokrat ji Elmanan, Kurdan, Tîrkan û ji welatêن dîn rabûn sîlav lı komcivinê kîrin, bir û baweriyêن xwe lı ser pirsa Kurdan, pirsa karkerên Kurd û yên biyani lı Elmaniya Federal eşkere kîrin û piştgiriya xwe bî gelê Kurd û KOMKAR'ê ra nişan dan.

Êvara roja 18 dı vê salona mezîn da şenahiyek çêbû. Def û zîrnê lêxist, keç û xorêtên Kurdan govend kîşandin, leyistikên welat ji hêla Vanê, Elazîzê nişan dan. Komek ji zarokêن bîçûk 5-7 salê derketin, listin û sér-

kar gelek pê şabûn. Sinetkareki Kurd, İsmail lı ser rewşa karker û gundiyan pandomimek xweş nişan da. Kamil, Kemal, Delal û Şêxo û koma zarokan kîlam û stranên gelêr û yên şoresser gotin.

Lı dawiya şevê gava kîlamên govendê destpê kîrin, bî sedan kes, jîn û mîr û zarok rabûn ketin govendê lı çarmedor leyistin.

Salonê bî şiarên şoresseri, "Biji KOMKOR", "Biji Azadiya Kurdistan", "Biji Piştgiriya İnternasyonalî", "Biji Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Tîrkîyê" deng da.

Roja dinê lı ser rapora kar û bar axaftin çêbû. Lı dawiyê rapor bî hemû dengan hat qebûlkîrin û bîryar hatin girtin lı ser tevgera gelê Kurd, lı ser aştiyê, pîrsa karkerêni biyani û karkerêni Kurdan û lı ser pîrsa civanan.

Dî dawi da komita rêvabîrinê ya nû hat hilbijartîn.

Dî nav bîryarê KOMKAR'ê da xasîma bîryara ku lı ser karkerêni biyani û lı ser heq û mafêni karkerêni Kurd hatibû girtin gelek giring e. Jî ber ku ew, xebateke nu datine ber rîxistin û xebatkarêni Kurd, ne tenê lı Elmaniya Federal, her usa ji lı hemû welatê xerbi ku karkerêni Kurd gelek lê ne.

Hîn daxwazêni KOMKAR'ê ev in :

- Bîla zarokêni Kurd bîkambîn bî Kurdi bîxwinnîn dî dibistanan da;
- Bîla zîman û çanda Kurdi ra alikari bê kîrin;
- Bîla dî radyo û tîlevizyonê da bî Kurdi ji neşiret bîbe;
- Bîla bo Kurdan ji buroyêni alikariya civaki bêna sazkîrin;
- Bîla navêni Kurdi dî daira nûfûsa Elmanyê da bê qebûlkîrin;
- Bîla heqê xwe avêtinê (ilticayê) bê dayin bo welatparêzêni Kurdan.

KOMKAR'ê bo van daxwazan çend mehan berê dest pê kîr, kar û xebatkir. Qasê 20 hezar Kurd û dostê Kurdan yek bî yek ji radyo û tîlevizyona Elmaniya Federal ra name şandin û xwestin ku bî Kurdi ji neşiret bîbe. Gelek rîxistinîn piştgiriya xwe bî KOMKAR'ê ra nişan dan. Nûneren hîzba Gruna'an (Keskan) ku lı Parlamenta Elman in, ji van daxwazan ra xwedi derketin, gotin em vê pîrsê wê bibin Parlamenê.

Dîvê ku hemû Parti, rîxistin û komeleyêni Kurdan û hemû kesenê welatparêz ji van daxwazan ra xudi derkevin û dî hemû welatêni xerbi ku Karkeşen Kurd lê ne, bo pêkanina wan kar bikin. Ew daxwazeke baş û xebateke hêja ye bo gelê me.

BI

ELIN CLASON

RA HEVPEYVİN



ROJA NÛ : *Tu dikari bî kurti behsa jiyana xwe ya rojnamevaniyê biki ?*

E. CLASON : Nêziki bist salan e ez rojnamevaniyê díkim. Jî mîjda ye ku ez wek rojnamevan piştgiriya tevgêrên gelên welatên dinya sêyem díkim. Jî sala 1969'an şûnda, min li ser Cezayirê, Afrika Başûr, Vietnam, Şili, Filistin, Yunanistan û Kubayê gerek caran dî rojnameyan da nîvisi û piştgiriya tevgêrên pêşverû yê van welatan kîr.

ROJA NÛ : *Kingê te destpêkir piştgiriya tevgêra gelê kurd kîr ?*

E. CLASON : Xebata piştgiriye ji bo min ne tişteki nû û xerib bû, dema min dest bî piştgiriya tevgêra gelê kurd kîr. Pêwendiyê min yên pêşin bî pirsa kurdan ra, dî sala 1975'an da, pişti ku min Mahmut Baksi naskir, çêbûn. Jî wê salê heta niha, ez ji nêzik va bî pirsa kurdan va mijûl bûm. Heta niha ez sê caran çûme Kurdistanê :

1977 Kurdistanâ Tîrkiyê

1979 Kurdistanâ İranê

1983 Kurdistanâ Suriyê

Encama her serdaneke (ziyareteke) min li Kurdistanê, paşê bûye pirtûk, film û mîqale.

Dî van deh salê dawin da min wextê xwe yê vala da pirsa kurdan. Min û Mahmut bî hevra û min bî xwe, me dî rojnameyan da li ser rewşa gelê kurd û Kurdistanê nîvisi. Dî sala 1979'an da, pişti ku ez ji Kurdistanâ İranê vegeriyam, me komiteke piştgiriye avakur. Li ser navê komitê me bulteneke agahdariyê -Information om Kurdistan- desxest. Paşê ku li Tîrkiyê cunta hate ser hukum, me giraniya xebata xwe da ser rewşa Kurdistanâ Tîrkiyê. Wek Komite, me bî Federasyona Kurdan va tevayı li diji cuntayê meş û mîting çêkirin, belavok belavkîrin û dî rojnameyan da nîvisand.

ROJA NÛ : *Heta niha te piştgiri û dostike germ nişani gelê kurd daye. Jî bo me ev piştgiri hêja ye. Tu bî xwe sedemê vê piştgiriye çawa şirovediki ?*

E. CLASON : Qedexekirina ziman û çanda mîleteki li diji mafêن mîrovatiyê ye. Bê şik ev neheqiya han nayê qebûlkîrin.

Rewşa kurdan, ez dikarım bêjîm ku ji rewşa filistiniyan û ji rewşa Afrika Başûr ji xîrabtir e. Pişti ku ez ji nêzik va bî pirsa kurdan va mijûl bûm, min fehm kîr ku zordestiya li ser gelê kurd bêhempa ye. Beriya cuntayê ez çûbûme Kurdistanâ Tîrkiyê, hê wê demê idara urfi ji tunebû, lê min bî çavên xwe dit ku Kurdistan mina zindaneki bû. Li her derê cendîrme û esker tiji bû. Pişti vê gerê min fehmîr ku pirsa kurdan jî bo Tîrkiyê, pîrseke pîr gîring e.

Pişti cunta 1971'an gelek multeciyêni siyasi ji Tîrkiyê hatîbûne Swêd. Dî nav wan da kurd kêm hebûn. Wê demê Mahmut xarita Kurdistanê çap kîribû û li ser vê yekê gelek entelektuel û çepên tîrk, nerazibûna xwe diyar dîkirin. Piraniya ronakbirêni tîrk, herçend xwe radikal nişan dîdan ji, li hember mesela kurdan vekiri ne bûn. Wan dîxwast ku zêdetir bî pirsa Tîrkiyê ya gişti va mijûl bîbim.

Qedexekirina zimaneki nayê qebûlkîrin. Min xwazt ez pirsa kurdan bîdim naskîrin. Ez bawer díkim ku min rasti hilbijartîye.

Min dî salê xwe yên pêşin da mîla xwe da ser ramanêni sosyalistiyê û ez dî VPK (Partiya Çep ya Komunistan) da xebîtim. Li diji njadperestiyê û zulma li ser gelê kurd bêdeng naminim, ev yek ji xwe berêva wezifa min e.

ROJA NÛ : *Mirov dikare bibêje weki rewşa gelê kurd ji aliyê gelê Swêd da baş tê zanin û naskırın ? Ditma te çi ye li ser vê yekê ?*

E. CLASON : Pişti ketina Şahê İranê, pîrsa kurdan zêdetir hate naskırın. Wê çaxê, dî weşananda (radyo, rojname uhwd.) pîrsa Kurdistanê gelek deng da. Paşê ku cunta ji hat, ev pirs her çû di radyo, rojname û TV'da xwe da xuyakırın. Lî Swêd hejmara multeciyêni siyasi yên kurd pirtir bû. Sazgehêni (daireyêni) resmi, bî awaki pirali bî kurdan ra ketin nav pêwendiyän. Van sazgehêni han (wek: SIV, dairêni sosyal, polêsi, dibistan, zarokxane uhwd.) xwestin ku li ser kurdan, ji gelek hêlan va agahdar bin. Lema girtina agahdariyêni li ser kurdên li Swêd, her wusa bûne agahdariyêni gisti li ser rewşa gelê kurd.

Ango hebûna kurdan li vi welati, ji bo nasina pîrsa kurdan, sedemeki berbiçav û konkrete e. Paşê hebûna federasyona kurdan, xebata wan roleke baş dileyize. Ango ne tenê ez û Mahmut dixebitîn ji bo danasina gelê kurd. Her wusa kom û komelêni kurdan ji hene û li ser rewş û tevgera gelê kurd informasyonê belav dikin.

Nîha li Swêd, bî awaki fire tê zanin, weki kurd xwediyê ziman û edebiyatê ne û zimanê kurdi zimaneki indo-ewrupi ye. Multeciyêni kurd bî xwe li mafê xwe geriyan, daxwaz û pêşniyazên xwe ajotne pêş. Wan da xuyan ku ew ji dixwazin wek hemû komên mihacir (wek: ispanyolan, yogoslavan uhwd.) bî zimanê xwe informasyonê wergirin. Xebatêni çandi, belavkirina kitêban, xwendegeha mamostatiyê, tercuman ji bo kurdan, derketina kitêba SIV'ê (Sazgeha mihaciran ya dewletê) li ser kurdan, filmêni ku me çê-kirine, ev hemû tiştên han bûne navgin (halet) ji bo naskırına pîrsa kurdan.

ROJA NÛ : *Xebatêni te yên dawin ci ne li ser pîrsa kurdan ?*

E. CLASON : Ez, birayê min û Mahmut, me bî hevra filmek çêkir, pişti ku em ji Kurdistana Suriyê vege riyan. Paşê me filmekê din, bî navê "Kine Em ?" çêkir. Bî çêkirina ve filmê mebesta me ew e ku em bîdin zanin weki kurd xwediyê zimanê xwe yê taybetine û kurd ji dikarin wek herkesi filman çêbikin. Her wusa kurd bî xwe û zarokêni wan bizanibin ku zimanê wan hêja ye û divê ew lê xwedi derkevin.

Filma "Zozan" ji bo zarokan, dî sala 1980'an da, serhev dî sê (3) besan da, dî TV'da hat weşandin. Nîha em dixwazin wê vege riñin ser zimanê kurdî.

Ew filma ku me li Kurdistana Suriyê kişandibû, bî navê "Welatê Me Kurdistan", dî dawiya meha gulanê da, li Polonyayê, dî festivala filmêni kurt da besar bû. Rexneyêni baş girt. Ji bo filma "Kine Em?" me muracaati festivala filmêni müsiki li Fransayê kir. Em hêvidarîn ku bête qebûkirin. Ji ber ku axaftina dî filmando, bî zimanê ingilizi û nivisandi lê tê zêdekirin, dî hêla navnetewi da rola wan ya propagandayê pirtir dibe.

ROJA NÛ : *Weki din tu gotinêni te hene ku tu dixwazi bigihini xwendevanêni kurd ?*

E. CLASON : Gotinek heye, divê em qet ji bira xwe dernexin: "Geleki yekbûyi nayê bindestkirin". Yekitiya kurdan, teminata serketina wan e. Ji bo xebata pişgiriyê ji, ji bo yên wek min ji wê hêsantrî bibûya eger yekiti hebûya.

Lî diji êşkence û zulma faşizmê li ser girtiyêni siyasi, xebateke hin ji xurtir pêwiste.

Divê malbatêni kurd, dî malda, bî zarokêni xwe ra kurdi bîpeyvin. Lî gor ditina min ev tişteki pir gring e.

ROJA NÛ : *Em sipasi te dikin ji bo bersivan.*

E. CLASON : Ez ji sipas dikim.

ŞÊRÊ MÊ

Girane eskeré Elê Osman, Nuri Paşa, Zeki Beg, Dewrêş Beg,
Alaya Sêêertê, firqa Wanê, Tabûra Bitlisê,
Hê turkê deşta Mûşê, pêxasê çiyayê Serhedê,
Eskerê Cwaxcûrê, mîclisa Yazurmê dakete deşta Mûşê,
Kete çemê Binalixê , kete ber ava Mûradê,
Di geliki kûrda avêtine ser me,

Seyêd-Xan bî sê denga gazi dike, li Elicanê Gerdangazi,
Li Tofiq, li Silheddin, dibêje:

"Bav û birayê min bûno, mîr bin, mîre çê bin,
Îro roja mîra ye, czê teminekê li we bikim, temina apê xwe mîşkînin,
Esker mekujin, êtim in, xirib in,
Zaroyê xelkê ne, bincmr in, gunene,
Bikujiñ zabit û qumandarê Cumhuriyetê, eduyê dinin,
Ez bavê Silheddin im di nava min û wan da
Ava Mûradê, hidûdê eczeme."

(Jî kilama Seyid Xan)

WELAT

Wexta ku bavê min eskeri kiriye ez pê nîzanîm. Hingê ez hin ne lî dinê bûme. Lê diya bin ew, gelek caran jî me ra gotîne, çawa bavê min jî eskeriyê zû zû reviye, bona vê yekê cendirmeyê Tîrkan çawa dî ser mala me da girtine, çawa bavê min, bo ku neyê girtin lî çolê û çiyan razaye, û çawa cendîrman dane dû wê dî nav garîsê himber da...

Bavê min çîma jî eskeriyê hez ne kiriye, ez pê nîzanîm. Ma kijan insanê Anatolê jî eskeri hez dîke? serda jî eger ew Kurd be.. Disa jî eskeri bî wi dane kîrin.

Bavê bin berê ne ewqas welatparêzeki hisyar bû. Bona ku em bî karê han mi-jûl dîbûn, hêrsa xwe bî me dîani, herçiqas me guh ne dîdayê ji wi disa şîretû nesihet lî me dikir û dîgot: "Hûn memûrê dewletê ne, dîvê wek bûka teze bin!" Ango bêdeng û baqîl.. Lê disa jî, min rojeki dit, piştî ku guhdariya kîlamê Kurdi kîr jî radyo Bexdayê, kelogiri bû û dengê xwe bîlind kîr got: "Lo, em Kurd bê xudi ne!..

Rojekê jî, baş nayê bira min çîma, gelek bî min hêrs keti bû. Got: "Tu wek Bolşewik i !"

Ez kenim û min jê pîrsi:

"Peki Bolşevik çîye?"

"Bolşevik.. Ango, merivê ku lî ali feqiran e, dîji dewlemendant e.."

"Ger usa ye, tişteki ne xîrab e.."

Lî dawiyê ew jî bû wek me: him welatparêz, him ji cep.. Berçavîkêñ xwe dîda ber çavê xwe û kovarêñ *Yôn û Ant bî sebr, hûr hûr dixwend. Bî riya xwe yê sıpi bû poropagandisteki baş dî nav gundiyan da.

Eskeriya wi ku çend caran jê reviya bû, dî dema serhildana Şêx Sait da derbaz bûye. Wi wek hîn kesan hez nedikir behsa rojên eskeriyê bîke. Lê serpêhatiyek xwe yê eskeriyê jî mîn ra gotû bû ku tucar jî bira mîn neçû. Ezê we ra ji bêjim:

Şêx Sait û merivên wi hatibûn girtin, serhildan şikesti bû. Leşker dî gündan da "paqîji" dikir. Tabûra me lî hêla Licê û Qulpê kar dikir.

Lî vir û wê merivên reviyayı hebûn lî çiyan. Carcaran dî navbera me û wan da musademe çê dîbû. Carêk Yûzbaşiyê me birindar bû. Lê meriveki hîşk û zalîm bû. Milê xwe yê pêçandi dî bin qapûtê xwe da veşart, disa lî hespa xwe suwar bû û wek ku tiştek pê ne bûye lî pêş me ajot. Ne dixwest esker sist bîbe. Meriveki bê merhemet bû.

Em nêzi gundeki bûn, me dit meriveki kal ber bî newalê direve. Leşkeran bî dû tifing berdan. Piştî çûn anin. Jî ling birindar bîbû. Ew bî ling va lî guliyê tûyê derdakîrin û bî çoyan lêxistin. Jê dîpîrsîyan gundi revine kiderê, lî ku xwe ve-dışerîn. Kaleki inat bû. Digo "ez tişteki nîzanîm." Belki bî rasti ji ne dizani bû. Piştî agîr berdane riyê, rebeni wek çirê şewiti, çû.

Gund wala bû. Esker lî malan belav bûn, lî pere, zér, tiştên usa geriyan, berikîn xwe bî kakîlê guzan, bî tûyan û bastiq tije kîrin. Xuya bû, hertiştên xwe lî wir hîştibûn, bona xilaskırına canê xwe piçek beri me revibûn. Dî nav malan da komikîn guzan hebûn, piçek jî wan teze hatibûn şikandin. Dî dizikan da rûn berojan da mast, dî pêteg û tûran da sawar û birinc..

Eskera rûn, penir, sawar û ard lî erdê belavkirin, hemû telefkîrin. Xwarina wan qedexe bû, digotin, dîbe ku jahrkiri bin.. Mih û bizin dî nav gund da bê xudi mabûn. Ew girtin serjêkîrn. Agîr dadan û sitilîn mezîn dan ser. Wê êvarê herkesi têri xwe xwar. Bo zabita ji berx qelandin.

Sîbê da zû em derketin rê. Ciye ku em pê ra diciûn bî dara beriyê xemîlandi bû. Nişkava dî nav daran da tifingek teqiyâ û yek jî me kete erdê. Tekmenek bû gule dî orta eniyê da xwarı bû. Em hemû ketin sengerê û ciye ku deng jê hatibû dane ber gulan. Teqe teqa makînelyan bû. Piştî em ji wi beyari hîlkîsiyan lê me kesek ne dit.

Em jî wi pozi derbaz bûn nebûn, disa tifingek teqiyâ.. Vê carê gedikliyek hatibû lêxistin. Esker disa lî hember gule barandin. Lê jî himber tu dengek dinê derneket.

Bî vi awayi bî saetan derbaz bû. Hercarê teqina yek guleyekê û jî me yek miri.. Tîrs ketibû dîlê eskeran.

Lî dawiyê em rasti rîça xwinê hatin û piştî pozeki me ew şerwanê xurt dit. Lî ser rû ketibû erdê dîrêj bîbû. Lî ser sing çar qor fişeng, bûkek ciwan û bedew bû. Guliyên wê yên dîrêj bî xwina singê wê war bîbû. ..

Gotineke Kurdan heye : Şêr şêr e, çi jin e, çi mîr e...

*Yön, Ant : Du kovarêن çep ku dî salê 1964 - 1970 dî lî Tîrkiyê bî Tîrki derketin.



LECA HELBEST Û SERPÊHATİYAN
BI NAVÊ HOZANÊ MEZIN

EHMEDÊ XANÊ

Kovara Roja Nû bî navê niviskarê Kurd yê mezin Ehmedê Xanê "Leceke Helbest û Serpêhatiyan" dî nav xwendevanan da vekiriye, hemû kes dîkarin tevi vê lecê bin. Armanca vê lecê ewe ku, alikariya xwendevanê nivşa nû bike, efrandinê wan pêşkêşî gel bike û edebiyata kurdi dewlementir bike. Mercen (hoy) vê lecê lî jêr xal bî xal hatine rêzkîrinê, em bawer dîkin ku xwendevanê mî wê tevi vê lecê bin û efrandinê bijarte û baştir tevi pêşketina edebiyata Kurdi bikin.

- 1 — Helbest û Serpêhati pêwiste bî zimanê Kurdi bêñ nivisandin.
- 2 - Her xwendevanek tenê bî efrandîneke xwe va dikare tevi lecê bibe.
- 3 - Helbest û serpêhatiyen ku wê bêñ nivisandin pêwiste ji sê rûpelan dirêjtir nebin.
- 4 - Her xwendevan hewce ji xwe ra naveki veşarti bîbîne û bînê efrandîna xwe bînive û adrêş bêñ diyar kîrin.
- 5 - Encamên vê lecê wê dî meha 10'an da bêñ diyar kîrin.
- 6 - Xwendevanê me pêwiste nivsarêñ xwe heta dawiya meha 8'an, lî ser adrêsa kovara "Roja Nû" rê bikin.
- 7 - Sisê dî warê helbestan, sisê ji dî warê serpêhatyan da 6 xelatêñ bêñ dayin. Ev xelatane lî Elmanya Federal, lî bajarê Berlinê, dî şeveke çandi da wê bêñ belavkîrin.
- 8 - Kovara Roja Nû, hemû efrandinê serfiraz wê dî kovarê da çap bike.


REDAKSİYONA ROJA NÛ

KEÇEKE KURD DI LECÊ DA KETE DEREÇÊ

Keçeye Kurd bî navê Berfin lî Swêdê dî warê nivisandina serpêhatiyan da, dî nav bî hezaran zarokêñ biyani da kete derecê û dî vê lecê da xelatêk girt. Ev keça Kurd dî serpêhatiya xwe da lî ser rewşa Kurdistanê, zordestiyen lî ser gelê kurd û hatîna xwe lî Swêdê sekiniye, bî zimanê hêsa benda xwe nivisiye. Berfin bî xwe 13 saliyê û niha lî Swêdê dîmine. Ev leca ji aliyê rêxistinêñ "Barnjournal" û "Allmanna Barnhuset" hatîye amadekirin. Ji aliyê dîn helbesteke vê keça Kurd ji, dî pirtükeke helbestêñ zaro-kan da hate çapkîrin, navê helbestê "Dar" e.

60 SALIYA SERHILDANA ŞÊX SEİD

(1925)



*Hay li minê
Ezê bî deşta Dîyerbekîra şewuti ketim
Dilê minê bî halê mun şewuti
Grane dengê top û metralosa û teyara bî şefega
sibê ra
Bî ser eşirê kurda va heriki
Şêx Seid Efendi bavê Ali Reza li aliyê
Kurdistanê dikir gazi digo:
Bavikino, mérê çê bin, çê bixebeitin, mérê Trîka
bikujin,
Dilê minê bî herba Kurda û Trîka pur şewiti...*

MUNZUR

Tevgera Şêx Seid dî diroka Kurdistanê da ciheki gîring digre, isal sersaliya vê tevgera dikeve 60 saliya xwe. Zarokên dî wê dewrê da hatine dinê, iro kalê rûsipi û pirên porsipine û ew niha 60 saline.

Beri 60 sali gelê Kurd jî bo mafêن xwe yên netewi û demokratik serê xwe hilda û li diji neyaran bî cengaweri şer kîr. Burjuvaziya Tîrk bî teror û bî zor ev berxwedana dî nav xûnê da hişt. Bî deh hezaran mirin û birindar bûn. Van êş, kovan û kulên mezin paşê tovên serhildanê Giridaxê û Dersimê avda.

Jî bo serketina hêzên pêşverû, ev rojêن buhuri û diroka me gelek tiştên hêja va tijiye. Vekolandina diroka Kurdistanê û fîrbûnû tiştên kêrhati jî ber vê dirokê, wê serketina gel hin jî nêziktir bîke.

Destpêka Şer da Şertêن Diroki
Çı Bûn ?

Paşi çar sal ajotina şerê Cihanêyi Yekemin, imparatoriya Osmani bin ket. Hê-

zêñ emperyalist dî navbera xwe da peymana Sykes Picot dî sala 1916'an da bî veşartti imza kîrin. Wan angori vê peymanê dewleta Osmani dî nav xwe da beş kîrin. Erdêñ ku jî dewleta Osmani hatin rizgar kîrin, dewletêñ emperyalist li ser van erdan dewletêñ derewin damezerandin.

Dî sala 1918'an da, İngilizan lî Baxdayê û lî beşeki Kurdistanê dewleta Iraqê saz kîrin. Frenşê jî, lî Suriyê û lî hêla Ciziri dewletek saz kîr. Xetêñ axa Kurdistanê dî vê demê jî nûh va hatin kişandin û Kurdistan bû çar perçan.

Jî vi şeri Kurdistanê ji gelek zerar dit. Gel bî baçêñ giran va hatin girêdan, kedxwariya abori zêde bû, gel hate zêrandin. Nêxweşiyêñ giran dî nav gel da peyda bun. Gel jî erdê xwe hate dûr xîstîn, wan gelek kes şandin leşkeriyê. Bî vi tehri aboriya welat sero-bîno bû, pêşketina cîvaki hat sekinandin, welat dî nav şer da hate hilwesandin. Jî aliyê din gelek faktorêñ der û hundur jî bîna gelê Kurd teng dikir. Edi jî der serhildanê tu rêke xelasiyê ne mabû.

Lî hemû cihanê, dî nav van salan da hejmarên şerên rizgarbûnê zêde dibûn, tekoşinê mafê çarenusi bilind dibûn. Dî sala 1917'an da Şoreşa Oktobirê ser ket. Vê bûyera mezin, dî nav gelên bindest da agîrê şoreşê gur dikir. Ev şoreşa jî bo van gelan bûbû hêvikê.

Dî sala 1919'an da Prensipê Wils. li hemû cihanê tesireke mezin nişan da, gelên dî nav dewleta Osmani da cih girtibûn, paşi "Prensipê Willson" baweri û hêviyê jî bo mafê çarenusi hin ji xurt dikirin.

Dî navbera van salan da li Kurdistanê Gelê Kurd li hêla bajarê Koçkiriyyê ser hilbabû. Ev serhildana ji aliyê zordestan da bî hoviti hat şkeştandin. Edi daxwazê zordestan diyar bûn.

Hêzên ku dî Şerê Cihanêyi Yekemin da serketin bî dewleta Osmani va peymank dî sala 1920' an da gîredan. Angorê vê peymana bî navê SEVR, pêwist bû Kurdistanê otonomi bê sazkırın.

Lê, Peymana Sevr, peymaneke miri bû, daxwazê vê peymanê tu wext nehatin bi cih anin.

Kemal Ataturk, li diji emperialist dema dest bî şer kîr, alikari û piştgirtiya Kurdan dîgeriya wi li ber Kurdan sond dîxwa, weki paşi şer, mafên Kurdan yê netewê û demokratik wê bêن dayin. Kurdan bî Tîrkan va tevayı li diji emperialist dî vi şeri da cih girtin. Burjuvaziya Türk paşi şer welatê xwe azad kîrin û emperialist ji welatê xwe bî dûr xistin. Paşi peymana lozanê dî sala 1923'an da, êdi ev dewleta Tîrkan ya nûh bî serfirazi karê xwe dîqendan.

Wan, dî Konferansa Lozanê da hemû xalêñ peymana Sevr avitîn aliki. Lî ser pîrsa Kurdan tu raberzin nehatin çêkîrin. Tenê petrola Musulê wê dî nav erdê kijan welati da cih bigre, li ser vê pîrsê hat sekandîn. Noker, xayîn û axa-begêñ eşiran, ji vê konferansê ra bî navê gelê Kurd telgrafêñ razibûnê dışandan û dîgotin "Em dîxwazin bî gelê Türk va hevra bijin. İsmet Paše dîkare temsila me Kurdan ji bike".

Paşi xurtkîrin û bî cih kîrina dezgahê xwe, burjuvaziya Türk, hemû mafên gelê Kurd yê netewi û demokratik hilda bin hîngan, li diji gelê kurd hin ji dir û har bû.

Burjuvaziya Türk, dî sala 1924'an da "Zagona Bingehin" pejirand û hemû kes kîrin Türk. Bî kîncêñ Kurdan va gerin, guhdarkîrina muzika kurdan, parastina edet û

kevneşopiyêñ kurdan yê netewi êdi bûbû guneki mezin li "Cumhuriyeta Tîrkiyê".

Burjuvaziya Türk, hemû gotinêñ xwe yêñ dî dema şer da soz dabûn, bir kîr. Hebbûna welat û hemû mafêñ demokratik yêñ gelê kurd hatibûn inkar kîrin. Ji der şerê netewi qet riya xelasiyê êdi ne mabû jî bo gelê Kurd.

Jî ber vê yekê dî sala 1922' an da komek ronakbir û welatparêzêñ kurd hatin bal hev û bîryarê sazkırına rîxistinêkê damezerandin. Miralay Xalit Beg bû serokê vê rîxistinê. Dî nav vê rîxistinê da gelek avokat, doktor, subay, şêx û kesen mayin cih girtin.

Armanca vê rîxistinê ew bû, Kurdistanê azad bê sazkırın, dî vê wari da tekoşineke bî çekdari bê dayin.

Vê rîxistinê dî nav demeke kurt da gelek endam û piştevan li dora xwe berev kîr, li gelek hêlêñ welêt besen wê hatin ve kîrin. Dijmin, ji ber sazbûna vê rîxistinê, xêbatêñ wê, hatibû agahdar kîrin, bo vê ji hêzêñ neyar gelek xemgin û aciz dibûn, ji aliyê din hertim xebatêñ rîxistinê pêkol dikirin. Wan dîxwast hê ev rîxistin xurt nebüye, dî nav gel da şax venedaye, pişta wê bîşkênin, wê qels û jar bikin. Dî dawiyê da ji wusan bû, serhildanê hê despênekiribû, rîxistinê xwe dan dest, ketin ber pençenê dîjmin. Rojeki Usif Ziyâyê Bitlisi telgrafe ke bîrayê xwe Riza ra (ordiya tîrkan da subay bû) şand.

Piştî şas femkirin û şirovekirina tîlgra fa Usif Ziya gelek zabit û leşkerê dî nav rîxistinê "Azadi" da kar dikirin vekîşyane serê çiyan. Lî tu ciyan kesek leşker li tevi wana nebû, dî dawiyê da, wan ji leşker ser best berdan, xwe ji çûn Suriyê.

Vê telgîrafê mecalek dabû hukmetê, hukmetê hemû kesen welatparêz yek-yek berev dikirin û digirtin. Dî nav wan da Xalit Beg ji hebû. Xalit Beg çawa tê :zânin serrokê rîxistinê "Azadi" bû.

Şêx Seid armanca dijmin baş fem dikir. Jî ber vê yekê guh neda gaziyêñ dadigehê û neçû. Dî dawiyê da ew çû li hêla Darahînê ciwar bû. Wi hertim li gel, gund û navçeyêñ li dorberê xwe ra pêwendî çê dikir, li ser bûyeran gel agahdar dikir, ji bo hilanina dubendiyêñ dî navbera eşiran da wi hertim şer dikir. Lê gel, ji ber êrişen lükmetê gelek tefekuri dikir, şas-metel mabû.

Dewleta Türk ji bo pêşigirtina karên Şêx Seid û ji bo şkandina rûmeta wi dî nav gel da, çi ji destê wê dîhat bî dardixist, wek gelek dek û dolavan. Carekê dema Şêx Seid diçe hêla Piranê leşkerên Türk, komeke cendirman dixwaze kesên hevalên wi bigre. Şêx dixwaze weki leşkerên Türk dest ji vê yekê berdin, dî dawiyê da Şêx Seid dinêre ev yeka nabe, lêdixin vê ko-ma leşkerên Türk qirdikin. Ev yeka bî lez rengê bûyeran diguhurine, herkez vedikşê xetêن xwe. Avahiyêن hukmetê, kerekol û cihêن mayin têن zevtkîrin, kesên li van de ran kar dikin, ji aliye kurdan da têن girtin.

Navça Darahinê dîkeve destêن kurdan û kurd karê xwe di vê navçê bî rîva dîbin. Bî vê tehri despêkirina vi seri, dijmin bî xwe amade dîke û kurd ji meebur dîmînin, dî roja 7.2.1925'an da tevi şer dîbin. Bî derxistina zagonekê va, tê xwastin weki Şêx Seid serokê hemû hêzan, hemû beç û dil-esir pêwiste li Darahinê berev bîbin.

Lî paytextê Turkiyê Enkerê kulisên politik her dîçin zêde dîbin. Bî lez li Kurdistanê "Rêvabırına Bî zor" tê elam kîrin. Yektayêن leşkeri û cebirxanê mezîn li berbi Kurdistanê tên şandin. Baça Aşar ji ortê tê hilanîn. Hukmetê dixwest bî vê yekê va riya alikariya feodal û dewlemeñ-dan li tevgerê bîbire, tevgerê jar û qels bîke.

Partiya Cumhuriyeta Gel hin tedbirêñ gelek hîşk pêkanîn û pêşneyareke gelek hîşk di meclisê da pejirandin. Kemal Ataturk û İsmet İnönü ji piştgirtiya vê pêşneyarê kîrin. Dema ev pêşneyar hat pejirandin, li şuna serokvezir Fethi Begê, İnönü derbazi li ser vi kari dîbe. İnönü ji der tedbirêñ pêşin zagona "Takrir-i Sukun" derxist û du dadigehêñ serxwebûnê saz kîrin. Ji van dadigehan yekê tenê ji bo Kurdish fermanêñ mîrinê derdixist, ya din ji h Enkerê li diji kesen li hemberi hukmetê kar dikin hatibû sazkîrin, armanca wê ew bû weki van kesan bêdeng bihêle û zordestiyê li wan bîke.

Lî gelek hêlan serhildanêñ mezîn des-pêkirin, vê yekê gelek zora dijmin bir. Lice, Xani, Siverek dî roja 2-3-1925'an da kete bin bandora Kurdish û dor li Diyarbekrê hate girtin. Paşı hevketin û êrisêñ dûr-dirêj komeke 60 kesan pêk tê, ji bende-nêñ kete nav bajêr, lê dî dawiyê da neçar man û bin ketin (27-3-1925).

Lî hêla Vartoyê Kurdish êrisêñ mezîn birine ser leşkerên Tîrkan ew geleq perişan kîrin. Lê, dijmin paşê pişt ji eşêra Lolan girt û derbêñ xedar li Kurdish xist. Vê ye-

kê rewşa dijmin xurttir kîr. Dî roja 19-5-1925'an da li Bitlisê Miralay Xalit Beg û Usîv Ziya hatin dardakîrin. Dema Kurdish ev xebera bihist, bî pêşengiya Xalitê Heseni hêzêñ kurdan êris birine bajarêñ Muş û Malazgirê, paşê ev bajaran xistin bin destêñ xwe. Dema Kurdish dit, weki rewşa wan ne başe, wan xwe avite Kurdistanâ İranê.

Hêzêñ bî pêşengiya Şerif Paşa û Yado bajarêñ Palû û Elazixê zapt kîrin. Dema rojekê dî cebirxanê da teqinek peyda bû, vê yekê dî nav kurdan da bêgumani û dubendi pêkani. Dî nav leşkerên Kurdish da bê disiplini û tevlîheviyê, bîneciyeñ bajêr êşand û ew hatin hemberi hev. Vê yekê berxwedana li diji leşkerên Türk jar dikir. Dî daweyê da Kurd vekîsiyane berbi bajarê Palu.

Hukmeta Turkiyê bî destûra hukmeta Suriyê, leşkerên xwe bî riya hesin li hêla basur berbi Kurdistanê rîxist, ew hatin li dorberê bajarê Merdin û Diyarbekrê dor li Kurdish girtin. Ordiyên Şêx Seid li diji wan berxwedan, dî dawiyê da hêzêñ Kurdish berbi çiyayê Şeraffetin vekîsiyan. Bajarê Muşê ji di vê demê ji destê Kurdish derketibû..

Şêx Seid ji ber vê rewşa xerab dema bî riya pîra Çarbuhr xwest derbasi İranê bîbe, bî saya xayıntiya Qasimê Cibrani, dijmin dor li Şêx Seid û hevalêñ wi girtin û ev qefilandin. (27-4-1925).

Ev yeka despêka binketinê bû. Şervanîn ku bê serok man bî rojan xwe nedane destê dijmin. Ew li hêla çiyayê Giridak, Sason û Çapakrurê berev bûn û heta sala 1928'an li diji neyaran şer kîrin.

Ordiyên dijmin cebirxane û çek-sila-hêñ wan angori yên Kurdish geleki zêde bûn. Lê disa ji Kurdish bî mîrxasi, bî bineke fireh û cengawari tekoşin dan. Lî her derê, her kuçê, her malê gav bî gav Kurdish singê xwe kîrin siper û şer kîrin. Ji ber gelek tengasi û dijwariyêñ mayin, ev tevgera dî dawiyê da bîkêt.

Encamên Şer

Dî nav vi seri da hêzêñ Kurdish yên leşkeri ji aliye dijmin da hatin qîr kîrin. Bî saya Ordiya Tîrkan û "Dadigehêñ Serxwebûnê" li diji gelê Kurd êrisêke mezîn destpêkir. Lî diji Kurdish gili-gotinêñ ne baş û propagandake çewt û xelet hate ajo-tin. "Lî her derêñ ku sungypten Türk tê ditin, li wir pirsa Kurdish dîbê tune be" wusan dînivisi dî roja 7-5-1925'an da rojname-

yên Tirkan dî rûpelêن xwe yên pêşinda.

Hêzêن dijmin paşı şabûneke mezin, bî hoviti û bî darê zorê, hemû mafêن gelê Kurd yên demokratik û netewi, muhalefeta wi xeniqand, dî nav xwinê da hişt. Zulm û zordestiyê bêhampa dajot û dici. Jin, mîr kal-pir, zarokêن piçûk ne digotin hemû Kurd xwe ra kırıbûne dijmin û qir dikirin. Kemalizm bûbû hovitike mezin. Mîrovêن Kurd lî bêderan, lî aşan, lî meydanan dihatin berevkîrin û bî zêndi dihatin kuştin. Wan xwarinêن gel, alîf û gihayêن heywanan talan dikirin, wan gel dî nav birçi-bûnê da hiştibûn.

"Dadigehêن Serxwebûnê" şev-roj nedigotin li ser hev jî bo Kurdan fermanê mîrînê derdixistin. Paşı bî sedan vîr, derew û iftirayêن mezin, gelek kesêن welatparêz, ronakbir û kesêن bêgune hatin dardakîrin.

Dî şerê Şêx Seid da nêzkaya 200 gund hatin hilweşandin, 800 mali zêtir mal hatin şewitanin û 27000 kesêن bêgune hatin kuştin. Gelek kes berbi Sinop û Samsunê hatin ajotin, jî wana gelek rîda mirin.

Dî roja 28-6-1925'an Şêx Seid û 46 hevalê xwe hatin dardakîrin. Şêx Seid dema wê bîhata dardakîrin geleki bina wi fireh bû, ew rûsar nin bû. Wi dî dawiyê da wusan got: "Me jî bo Kurdistanê Azad şer kîr. Ez bawer dikim ku gelê Kurd wê heyfa xwe derine û wê Kurdistanê azad saz bîke".

Serhildana Şêx Seid Tevgerekê Çawa Bû ?

İro burjuvaziya Türk û berdevkîn wê dibêjin weki "dî nav tevgere Şêx Seid da fedalan, şêxan cih girtine, pêşengiya vê serhildanê kîrine, tiliya Ingilizan tev vê serhildanê da heye û daxwazêن dini ev serhildana pêk anîye, jî ber vê yekê, ev tevgere, tevgerekê kevneprest û pasverû ye." Bî vir, derew û bî destê propagandaya çewt û xelet burjuvaziya Türk li ser vê tevgerekê gelek tiştîn nerast ajotine pêş. Hin kesên xwe "Çep" dihesibinin ji geleki dî bin te-sira vê propagandayê da mane.

Bê şik tevgerekê li diji zordestiya netewi û kedxwariyê bejn dide, tevgerekê netewi ye. Eger ev serhildana serketa, dezgahê kolonyalizmê wê bîşesta, ziman, çanda gel wê pêşta biçuya. Ev yeka jî bo xêra gel û mafêن gel gaveke pêşverûye. Daxwazeke netewi ye.

Eger rengeki netewi, dî nav daxwazêن serhildana Şêx Seid'da tune bûya, dî wê demê da li Tirkîyê gelek Serhildanê kevneperest pêk dihatin, wê çaxê pêwist bû kevneperest, olperestêن Tirk-Kurd bûbûna yek, pişgirtiya hev bigirtana.

Çawa me li jor ji diyar kîr, wêki savciyê dadigeha Diyarbekrê û serokê wê, dî gotinê xwe da, ev serhildana vek serhildaneke netewi nişan dane. Jî bo vê yekê ji, ew kêsêن dibêjin "na ev serhildana ne serhildaneke netewiyê ye, ew serhildaneke olperesti ye" baweriyêن wan puç dîke.

Jî aliye din hin kesên din ji dibêjin weki tiliya Ingilizan dî nav vê serhildanê da heye. Dî vê demê da li ser rewşa bajarê Musulê çawa tê zanin gelek raberzin hatin çêkirin, dî vê demê da, ev serhildana teqiyâ. Disa istihbarata Tirk dî vê demê da gelek dokumenten çewt û xelet jî ber xwe amedekîrin, dî dawiyê da piropaganda kîrin, weki ev serhildana bî destê Ingilizan hate bi darxistin.

Herkesê zana û bî hish dizane weki Ingilizan dî vê demê da Kurdistanâ Başur xistibûn bin destê xwe û pey petrolê ketibûn. Ingilizan bî rasti ne dixwaztin li ber serê wan şerêşike din peyda bibe û pareki Kurdistanêke azad be. Wek çawa hukmeta Tirkîyê ne xwaze li kurdistanâ Iran û Irak azad bibe, li wir pêşîya tekoşina demokratik û netewi bend bîke.

Serhildana Şêx Seid Çima Bîket ?

Pêwiste em li ser sedemêن bîketinê vê serhildanê bisekinin û hin dersan jê derxin.

— Lî Kurdistanê pêwendiyêن feodal dî vê demê geleki xurt bûn. Dî nav vê sazumanê da çinên modern hin pêk nehatibûn. Cina karkeran nikaribû dî vê demê da pêşengiya vê tekoşinê bîke.

— Hevketinê dî navbera eşiran, du-bendiyê mezheban geleki kîri dijmin dîhat.

— Vê serhildanê li hemû Kurdistanâ İşax veneda. Lî hin hêlan şer geleki hisk û dijwar bû. Lê li hin hêlan bêdengi û arami hebû, aligirên vê tune bû. Jî ber vê yekê dijmin carîna hezîn xwe bî lez li van hêlan berev dikirin û li ser Kurdan da dîşandin. Dersim ketibû dorê, dijmin çav berdabû vê navça Kurdan. Lê dijmin ne dî-

xwast ji nişkêva êrişi ser Dersimê bîke, hêviya demeke musayit mabû.

— Jî aliyê teknik, taktikên politik û aboriyê da tevger jar bû. Çekeke otomatik dema dikete dest, hejmara kesen wê bî kar binin, gelek kêm bûn. Vê yekê, dî warê wundakırına mirovan da geleki zîrар digi-hande tevgerê.

— Bî tehreki merkezi, rêvabırına tevgerê gelek dijwar bû, tunebûna planen şer û bêdisiplinîyê tevger berbi binketinê dibir.

Jî der xurtbûna dijmin dî warê çekan û mirovan da, dijmin carîna bî hêzên kolonyalist yên mayin va hevkari pêk dani. Vê yekê ji tesireke mezin dî warê binketinê da list.

— Hêzên kolonyalist zanibûn weki Kurdistan dewlemende, jî ber vê yekê rizgarbûna Kurdistanê nedixwastin.

— Faktoreki mayin ji, beri despêkirina serhildanê girtina pêşengên tevgerê bû. Dijmin jî her tiştî agahdar bîbû, dijmin mecal neda Kurdan, weki ew xwe amade bikin, hêzên xwe berev bikin, leşker û serokên kurdan xwe bîghinin meydana şer. Hemû rê hatibûn girtin.

Jî der van sedemêن jorin, gelek sede-mên mayin ji hebûn, weki binketina Kurdan hêsatir dîkir.

Em hemû goriyên (şehit) tevgera Şêx Seid bî hurmet bir tinin. Ev tevgera dî tekoşina gelê me da, tekoşina netewi û demokratik da merhaleke mezine.

Goriyên gelê me wê bêñ biranin.

SUKERMAN

Û XEBATÊN WI YÊN

KURDZANIYÊ



İ. Sukerman niha hesab dibe kurdzaneki welatê me yê bî nav û deng. Ew dokto-re ulmê zimanziyê ye, pêşengeki zimanziya kurdi ye. Gelek salan ew dî instutiya Rohilatziyê ya Akedemiya Ulmen li Leningradê da xebitiye. Ew bûye şagirti kurdzane navdar Qanadê Kurdo. Pey qedandina xwendina bilind û beşa kurdzaniyê da, bî tevi Ereb Şemo, dî sala 1932'an da destpêdike bî gramatika zimanê Kurdi va mijûl dibe, ew paşê çend nivisarên li ser zimanê Kurdi dînivise.

Sukerman, dî sala 1936'an da, bî serfirazi disertasiya xwe ya derheqa tewandina navan li zaravê kurdêن Ermenistanê da xwey dîke (pawan dîke). Paşê, ew disa bî kel û ced, bî dil û can pirsên zimanê kurdi va mijûl dibe, gelek bend, berevok û xebatên wi yê mayin çap dibin, bî saya kijana ew wusan ji navê doktorê ulmê filologiyê dest tine.

Nameke xwe da kurdzanê bî nav û deng, Serokê Akademiya Kurdi li Iraqê yê pêşin Kemal Mezher (niha zaniştgeha Suleymaniye da mamosteye) ji Sukerman pirs dîke, ku çawa bû, weki Sukerman bî xwe bî kurdzaniyê va girt, çîma ewi ew rê ji xwe ra bi-jart. Sukerman bî vi awahi bersiva wi dide:

— Ez havina sala 1931'an, lî beşa ingilizi da ya instutiya Leningradê ya dirok, filozofiyê, litteratur û zimanziyê da hatim pejirandin (qebul kîrin), lê dersan zivistanê destpêdikir. Ez wê çaxê bî demeke derbazok hatim kîşkîrin, ku beşa zimanê kurdi da şeş mehan hinbim. Berê min qet nizanibû ji, ku li rûbarê cihanê kurd hene. Beri her tişti dewlemendiya zimanê kurdi (zaravê kurmanci) ez zendegirti hiştum. Ez wê behra bê-serobin da kar bûm û ava wê behrê çawa dibêjim, ji min ra bû ava avilheyatê.

— Paşê ez bî zargotina kurdi va mijûl bûm -Sukerman dibêje- min nasiya xwe da nimunênen wan efrandina, ku ev gelê rohilatê yê kevn û aqilbend dî nav sal û zemanan da saz kiriye. Eger ji min ra li hev bihata hemû tişti seri da destpê bikim, minê ji stranen kurdi destpêbikira û ezê tenê bî wan va mijûl bûma...

İsaha Sukerman, eva 60 sala bî karêñ zanisti va mijûl dibe, bî taybeti li ser ziman-zaniya kurdi. Ew salêñ cihê-cihê bûye doçentê instutiya Leningradê ya zimanêñ biyanê. Paşê ew bûye serwerê kursiyê wê instutiye ya Zimanziya giştî (tomeri). Jî sala 1931'an vir da ew bûye endamê Partiya Komunisten Yekitiya Sovyet. Sukerman, wusan ji li diji Ordiyêñ Hitler, tevi şerê welat bûye. Ew bî çend medalye û nişanan va hatiye rewakirinê.

Sukerman, dî sala 1962'an da pirtûkeke gelek hêja nivisi, ev pirtûka bî navê "Serhatiyeñ Zimanziya Kurdi" jî aliyê Akademiya Yekitiya Sovyetan ya Ulman da hate çapkîrin. Bona amedekirina vê pirtûkê bawer bikin ewi hemû pirtûkêñ zargotin û zimanê kurdi daye xebatê, ku hetani wi çaxi hatibûn weşandin. Sukerman çend bend û lêgerinê xwe ji, dî nav weşanêñ din da, bî navê xwe yê kurdi va - İskoyê Usiv va weşandine.

Sukerman wusan ji çend bendêñ hêja li ser zimanê kurdêñ Xoresanê-bakura Iranê nivisiye.

Ew niha li Moskovayê dîmine, ew teqawit bûye.

TÊMÛRÊ XELİL

Jî helbestên elmani

LI SIRGÛNÎYÊ

Rojekê jî rojan weliteki mîn jî hebû, pir çeleng;
Dîrêj dîbûn têde mazi*, bînevşan xwe li ba dîkîrin.
Xewnek bû ew ax, çi xewnek ciwan.
Ez radîmûsandim welêt bî zîmanê bav û kalan,
Bî mîn ra dîgot bî Almani
(nayê aqîlan çîqa xweş bûn ew peyvîn şîrin.):
"EZ HEZ DIKIM JI TE".
Xewnek bû ew ax, çi xewnek ciwan.

*mazi : cînsek daran

LAWEK JI ASRA

Keça çeleng qiza sultêن
Bî hatîna êvarê ra
Berê xwe dîda çaviya ava zelal,
Sivîk sivîk dîçû dîhat.

Ebdeki xort êvar êvar
Lî nêziki çilîkên ava zelal
Xwe dîda benda keçikê,
Heku dîçû melûl dibû.

Xatûn rojekê bervê hat:
"Navê xwe tu zû bîde mîn,
Xelkê te kiye bêjê lawo,
Tu jî kijan welati yi !"

Ü xortê ebid ji bersiv da:
"Muhemmede navê mîn, jî Yemen,
Ez jî eşîra Asra me,
Dema aşiq dîbin ew dîmrin."

REINRICH HEINE (1797-1856)
Wergerandin jî Almani : Şahînê B. Serokli
(Sydney - 1985)

GIRIK

Ax, xweli lı serê me keran be; em ji berê wek qûl (Beni Adem) xwedi ziman bûn. Zimanê me hebû, çand û bejeya me hebû, helbest û stranên me yên rindik hebûn; ango berê me his û daxwazêñ xwe bî zimanê xwe bî hev fêmdikir û ne wek niha bî zire-zire.

Erê ez beni, ji wi zimanê me yê dewlemend niha du peyvok mane: Ha.....Ho. Bê guman hun ecêb-mayi dîminin ku çawa ew zimanê me yê kûr fere iro bî du peyvîn HA û HO maye. Bî kîni ecêb û olexanek hat serê me, hîşen me firandin, em bîzdoyi kîrin û lewra zimanêñ me ketin hev, lî hev fertîlin û wîsa me zimanê xwe ji xwe bira kîr. Ji roja wê bêtarê şûnve, nema tiştek tê bira me ji xencê Ha û Ho.

Çiroka gırıka zimanê me çirokeke kevne. Ber bî sedan sal bapirek me lî newaleki bî dîlek şad stiranek dîgot û ji xwe ra dicêri, dema binek beyani ket pozê wi. Bapirê me serê xwe jorve hîlda û nefesek kûr kışand; ev bina qewin ya guran bû lê wi xwe xapand û bî xwe ra got, "ev bin ne ya gurane". Bina gur her ku çû pîrtîr bû û keseki nedikanibû êdi hebûna wi inkar bîke. Ditina gur ji lî ser erdê me her dem bî mîrinê ve gîredaye.

Bapirê me berdewam kîr bî xwe ra bîbêje, "na, na tu gur lî vê derdorê nayêñ ditin". Ew ber xwedê geri ku gur ji wi dûr bîminin. Demek kîn derbas bû ta ku dengek beyani û ne xweşket guhêñ wi, dengê gur!

Guhêñ bapirê me baş vebûn û xwe dan ser deng. Tu guman nema êdi, ku ev dengyê gurane lê ji ber ku dîlê wi weqa ji ditina guran aciz bû, wi çêrandîna xwe domand û xwe lî hebûna gur nekir xwedi, yê ku hêdi hêdi ber-vi wi çû û nêziki lê kîr. Disa bapirê me bî xwe ra peyivi bo xwe inakîrin bîde ku ev ne gure. Dengê gur êdi dest pê kîr dî guhêñ wi de bîke zinge-zing lê disa ji wi bî serişki got: "na, na, gur lî vê derdorê nayêñ ditin". Dûra serê xwe rakîr û dit çawa gurek lî serê gir ji nav mij têye der. Canê wi dest pêkir bîricife û tamarêñ wi vêre sist bûn, lê disa ji wi bî xwe ra got: "na, ez bawer nakîm ev gur be; ev tiştek dîne". Serê xwe dî nav gîhayê kesk da veşart û bî dîzi got: "Ew lî ber çavêñ min wek gur xuya dîke lê ew ne gure". Dûre çavêñ wi disa lî gur ketin, yê ku niha dî nav daran da dîbezi. "Na, na, ma gur lî vir çî dîke?", got bapirê me, "bê guman çavêñ min êdi baş nabinin". Dî navbera wi û gur da sê-çarsêd mitro man, dema ew qiri û bang kîr: "Xwedêyo, ma rast ev gurê? Na, na, ez bî qurbana te bîm, bîla ne gur be". Dî navbera wi û gur da man pênc mitro lê disa ji wi got: "bî

daxwaza xwedê ev tiştê lı ber çavêن min ne gure. Ma bo çi gur be? Belki ew hıştire; yan file û yan tiştek dine; belki ji tew tiştek lı pêş çavên min tune! Belki ez xırifi me, êdi tişt lı hember çavên min dîbin gur".

Qasi çekirina kevireki wêde, gur dest pê kir bervi wi bixuse. "Ez baş dîzanım ev tiştê dixuş ne gure lê çêtire ez ji ber birevim", got bapirê me û meşya. Dema lı dû xwe sér kir wi dit çawa gilêz bî derdora devê gur ketiye. "Ey xudayê mezin! Her tişt ji destê te tê der. Bila ev tiştê lı dû min tê ne gur be...". Tîrsa wi her ku çû pirtir bû û wi disa bî xwe ra şor kîr: "Ma ez çıqa bêhişim! Ez çawa ji ber pisikek kûfi direvîm; û ew lı ber çavên min wek guranıxuya dîke!!".

Ta ji dest wi hat der ew bezi lê belê wi reva xwe zor dereng hışt; dema wi lı dû xwe mîze kir wi dit çawa çavên gur dîbrûsine û êdi ew bî nefesa gur ya gerî ji dihesiya. Wi reva xwe domand û bî xwe ra dîgot: "na, na, ev nefesa ne ya gurane". Dema pozê gur yê şîl gihişt paşıya wi, tîrsa wi hin kûr bû. Ew lı paş xwe ziviri û baş dit çawa gur hemâ dixwaze xwe çeke ser wi. Ji tîrsan ra ket xwar û çavên xwe qurç kîrin bo ew gur nebîne. Lîvîn wi dîcîrifin û wi hin bî xwe ra dîgot: "Îşella ev ne gur be".

Dema gur gezek dî hêtek wi da lêxist, bapirê me bî dîranêni wi yên tûj hesiya, qiri û got: "Ez dîzanım ku tu ne guri; de bese êdi, min metîqtîqire*, ez ji qeşmeriyân hez nakîm". Gur gezêni xwe kîrin du û sê û devê xwe yê birçi ji goşte bapirê me tiji kir. Dema xwîna wi dest pêkir birje wi bang kir: "Ha...Ho...., ev gure, ha, ho....". Feyd û newal ji qîrin û nalina wi tiji bûn.

Ji ew roj vîrda, û ji derdê şîn û tîrsê me -koma keran- zîmanê xwe yê ciwan ji bira kir û em tenê dîbêjin Ha....Ho....

Ger bapirê me xwe nexapanda û hebûna gur ji destpêkê da inkar nekîra, goşte wi, wê ji hêla gur da nehata xwarin û wîsa zîmanê me yê çeleng ji wunda nedibû.

*tiqtîqandin : Dema yek bî tiliyêni xwe parsiyêni yek dîn dixurine.

Ev çiroka kîn dî kovara EL EREBÎ (Hejmar 309-8-1984) ya lı Kuwêtê tê weşandin dî bin navê EL-UQDE da hatîbû nîvisandin. Berêz SEFWAN ELŞELEBÎ ew ji Tîrki wergerandibû zîmanê Erebi û min ji Erebi wergerand zîmanê Kurdi. Ş.S.

Sydney XII - 84

Nîvisa Orginal (bî Tîrki) : Aziz Nesin
Wergerandina zîmanê Kurdi : Şahînê Sorekli

DENGBÊJ KEREM

Dı hejmara kovarêye bûri da, mixabin ji ber şâşiyekê dî bin nivêşarnasiya lı ser Kerem da, têxteke wi ya dîn hatîbû çap kîrin. Ji ber vê yekê, em wê serpêhatiya Kerem lı jêrê diweşinin.

Ev serpêhatiya, Kerem û mırına axê, qewimandineke rast e. Ehmed beg, axê gundê Xaça û xwedanê piraniyên mîrg û zeviyan bû. Lê tenê neh-deh malên wi gundi berxwe didan ku axa erdê wan zevt neke. Ehmed axa ji dikir wan bi tirs û zorê ji gund derxe û erdê wan ji xwe ra zevt ke. Rojekê lê dixe rûspiyê wan malan, Keko, dikuje. Birayê Keko, Xosrof ji tev pîsmamêm xwe va diciñe ber mala axê û gullekê berdiđinê, dikujiñ. Demekekê şunda jina axê cawê diciñe ser Kerem, ku were kilamekê bayêje ser,

Kerem dibê:

Mala min lı ebexê, lı aşê Kera.
Binya gundê me da du gund hene;
Yek Xaçaye, yek Bîzîrxane,
Çawa dibêjin usane,
Lema Kerem dinale.
Lı Xaça axak hebû,
Pêncsed pezêni wi hebû.
Lê bê kiras bû.
Usa ji mizire,
Hê tav nede, avê lı ser xelqê dibire.
Ewi çû lı ser wi deh mali bîri.
Mezinê wi deh mali navê wi Kekoye,
Jî bav û kalê xwe da ji Xenimine,
Jî axê ra go: "Kuro Ehmed bîhêle
Em zeviya xwe avdin, avê disa bidne te."
Ew axayê mîzir gote kurê xwe û xulamê xwe,
Go: "Evi têxne herqê bikutin!"
Caw hat, gotin axê mîzir Keko kuştîye.
Pîsmamê wi ji çûn, ewê mîzir kuştîn,
Bêra wi ma dî heriyê da...

Kerem dibê, ji Qeymez çûme Xaça,
Min rê lı hev pêça,
Û qulaça.
Min nîhêri, jînek ji wê da tê,
Lı bejn-bala wê mîze kir, sîpi û kêça.
Jînik heyderiye,
Kerem sêberiye.
Go: "Birao oxir be,"
Min go: "Oxira xêrê be."
Go: "Mala te lı kuye?"
Min go: "Lı Aşê Keraye"
Go: "Birao navê te çiye?"

Navê min Eli
Ku nebe dexeli
Ya jan, yan qeli,
Mexset nekeli,
Go: "Birayê Eli, dibêni Kerem lı ser axeler
û maqûlan distirê, ew raste?"
Min go: "Dayê, Kerem
Lı dem û dezgahê meriya dînhêre û dibêje."
Go: "Ku tu dici bêje wi kurê kerê,
Bila were lı ser min û mîrê min bistirê!"
Bî wê quranê wê dî vîrda lewîtand.
Min go: "Xwişkê! Tu bîri gora diya min,
Ez ji birime gêra bavê te.
Wele ew kurê kerê ezim,
Qiza kerê ji tu yi."
Go: "Weeee.. porê min kur be, Kerem tu yi?"
Min go: "Erê"
Go: "Qisûra min bibaxşine".
Min go: "Na, ez ji tera dêreki bîbirim,
Hezdîki xwe rakişine,
Hezdîki xwe dakişine."
Kerem nexşê wê datine.
Lê xwedati usa ji bedewe,
Jî qelaxê kîvş nabe,
Niha ji ji ber çavê min ranabe.
Navê wê çiye? Fatê,
Berê wê bîde, bî pê tê,
Heta ber têrtê,
Çî bîbiri ew lê tê,
Destkeşki bî xwe tê,
Repe-rep lı pey tê,
De min go, cîka dêrê metê lê tê..
Wê min bihere malê, kincê mîrê xwe bine,
dayne pêşıya min."

Min ji çav lê ye, poteki li xwe kım.
 Ewê kinc dernexist,
 Koneki reş derxist,
 Agir dilê min xist,
 Kincê birê min li erdê xist,
 Kela min tiji kır,
 Cote müşk ji nav derxist.
 İran dibêن: Kê şıkçı,
 Rom dibêن: Bekçi,
 Go, apê xwe bikim yolçı,
 Nihêri yeki qerti birçi.
 Min kincêن wi rakir, herd mil û pastiya wi heye,
 Weki dün tişte tu neye.
 Ne sükûre,
 Ne dibile,
 Paşı ji pêşiyê dibihire,
 Jinik li xwe dixe, Kerem bire-bire,
 Cika kurê kijanê dimire.
 Ez runıştime, kinc li ser milê min nin,
 Tesî ji dî destê wê da ye, dirêse,
 Dora Fatê ye, cika çi dibêje:

"Êêê ezê xwe qurbana te kım
 Hey-lo, lo-lo, hey-lo peyao
 Tu ser çavê min bavê min ra hati
 Heta niha çima qe nedihatı
 Bendekê bavêje ser bejna zıraw, reisê vi welati".

Min go" Can dayê can, te kezewa min biri,
 Tu hê ji Kerem dengbêjtiri.
 Min destê xwe da ber guhê xwe, dora Kereme:
 "Mehrûmê çûme Xaça beri li avê
 Xosrof gullek berda binya navê
 Evi heywani xwe rakisand, da ber tavê
 Bêra wi dî heriyê da ma
 Nîkare rêxê ji dî ser xwe ra bavê".

Go: "Oro rabe bicehme, çawa usa dibêji?"
 Min go: "Wele kela min tiji bûye,
 Birangê min kuştine,
 Tu ji jinbra min e,
 Bi xwedê ezê bêjim".
 Min disa destê xwe da ser guhê xwe,
 Ka şair Kerem çi dibêje:

"Ezê çûma Xaça li bilindciya
 Serê wi dane ser têr û ginciya
 Li dorê bû şinge-şinga zebaniya
 Simbêla wi li dêla kerê hev aliya
 Kerê bist û çar zitik dayê neqetiya
 Bejna zıraw li ser basmê welgeriya".

Fatê go: "Lo apo bese ha,
 Bila kurê min bimira,
 Min tu neaniya.
 Ez bizînekê bîdime te,
 Derkeve ji mala min here".

Min go: "Bî xwedê tu bî razi,
 Pezê xwe gîsti bîdi min ji,
 Sîna birangê min e, ez naçim."
 Fatê kinca ha kaş dikim,
 Ez ji ha kaş dikim,
 Şereki zaf girane,
 Xwedê ra em tenê dî maldane.
 Dora Fatê ye, dinale,
 Ü pêra ji dikale:

"Weyla mala bavê min şewitiyo
 Mîriyê min ezizo, min rezil kiro
 Kerem ketiye malê, ji mal dernakeve,
 Min bavê Tahar berbat kiro
 Min girt Kerem nav kefen da siwar kiro".

Min go: "Can dayê can
 Kerem ji te ra qurban".

Go: "Apo ka kincê mîrê min bide,
 Helbet vi welati da dengbêjeki dîn ji hebe".
 Ew kinca vi ali dikşine,
 Ez ji vi ali dikşinim.
 Ciye sax ji ew dîqelêşe,
 Derdê axê dilê da êşe,
 Dora Kereme, cika çi dibêje:

"Mehrûmê çûme Xaça darê dîri
 Sed û deh gund temam dî gorê da bîri

 Benda bin dî nîvi da bîri, go:
 "Oro here, tu dîdi xebera?""

Min go: "Na, ez fathê dîdimê,
 Wele ez naçim,
 Çawa cînazê wi bîhêlim,
 Jî şina wi derherim,
 Ma bendeka min, ezê bêjim,
 Ü paşê herim":

"Ezê çûme Xaça nînike
 Axa par ker bû, isal xotike
 Navê jina wi Fatîke
 Çûye Kerem li kewşen teklif dîke
 Cila kerê dî bin da çarta dîke
 Kincên axê li ber vedike
 Herd müşkan mina du bekçiyâ li ber radike
 Fatê go, Kerem gunê min stûyê te,
 Axê dî her teyiba da qeyd bîke".

Min go: "Dayê! Eva kincê te,
 Alem bîri gora bavê te,
 Ü gora mîrê te,
 Ew bizîna ku tu dîdi, min da xatîrê te".
 Serê pêxember digo, jînik usa kuta bûn,
 Çermê wê bizînê ji kışandibûne jînikê...."

GOTINÊN PÊSİYAN

- 1 - Aşa dinan bê av digere
- 2 - Ava golan bê tevgere
- 3 - Aqlê sıvik barê giran
- 4 - Agr ketiye mala derewçîyan, tu kesi bawer nekiriye.
- 5 - Agir berda komê xwe da aliyê zomê
- 6 - Aql tacê zêrine, seri hemû kesi da nine
- 7 - Axa xûlam ra go, xulam seyê xwe ra go, se ji dêla xwe ra go
- 8 - Berxê nêr ji bo kêt
- 9 - Buka xalê eziza malê
- 10 - Berxa çê li kozê da kıvş dibe
- 11 - Bilind fîri nîzm ket
- 12 - Berx heta hetayı bin selikê nabe
- 13 - Birina meriv bî xwe nexurine rehet nabe
- 14 - Bêje min hevalê xwe ez bêjim tu ki yi
- 15 - Behr bî devê sa pis nabe
- 16 - Biharê xwe ter neke
Payizê xwe derengi nexe
- 17 - Cêjika mara bê jar nabe
- 18 - Ciye şêra rovi lê dikin gêra
- 19 - Çavê li deriya xweli li seri ya
- 20 - Ciya çıqas bilind be,rê rojek wê pêkeve
- 21 - Dilê tırsok singê gewr da namine
- 22 - Dinya gulek e, bîhn bîke û bîde hevalê xwe
- 23 - Dijminê bava nabe dostê lawa
- 24 - Destê kîr bîde ser zîkê têr
Destê nekir bîde ser zîkê têr
- 25 - Dinya bûye kes tu kes negotiye bes
- 26 - Dilê firêh pir nabe
- 27 - Dizikê go binê min zêrin e
Hesikê go ez wê nav te da me
- 28 - Diz diz e,çî ga çî hêk dizi
- 29 - Diz dîza dîzi erd û ezman tev lerizi
- 30 - Dizê malê jî malê be ga jî kulekê dertê
- 31 - Devê nal kîrin, rovi çû got pe pe !
- 32 - Dewata mira agir feqira
- 33 - Dêl baye se Bexdayê
- 34 - Dor bî dore ne bî zor e.
- 35 - Ewê sir nexwe bêñ jî dev nayê
- 36 - Ewê ku dizikê çê dike
Wê çembilê wêji bixite
- 37 - Go koro te çî divê
Go du çavêñ roni
- 38 - Golika malê jî gayê malê natürse
- 39 - Gayê sor sortiya xwe bernade
- 40 - Hesp dibeze siwar pesnê xwe dîde
- 41 - Hespê çê zengûyan nagine xwe
- 42 - Heq nayê dayin tê girtin.
- 43 - Her giha ser koka xwe hêşin dibe
- 44 - Hate kuştin çî siwar çî peya
- 45 - İnsanê şixulkar gula geşe
- 46 - Jî ava gurgure netirse
Ava nermik bitirse
- 47 - Kurmê darê jî darê nebe dar narize
- 48 - Kevir baş e cihê (giraniyê) xwe da
- 49 - Kissedî zîkê merivda zindaniye gava derdikeve,
meriv zindaniye kissê xwe dibe
- 50 - Kurmê şirê heyâ pirê

Berevkar: VAZGAL

film



"WELATÊ ME KURDISTAN"

DI FESTİVALA "KRAKOW" DA BEŞDAR BÜ

Nivisara jêrê ji miqala ADAM GARBICZ, ku di rojnama "FESTIVAL NEWS" da hatiye weşandin, hatiye wergerandin.

Filma swêdi "Welatê Me Kurdistan" ya Elin Clason ji filmeke usa bû. Dîrêjaya vê filma dokumenter (belgesel niv seet û babetta wê li ser şehidbûna kurdan bû. Pêwiste mirov ji zehmet û xebata çêkîrina vê filma han ra heyran be ku têkoşina gelê kurd ji bo serxwebûnê şirove dike. Kurdistan... Ev welatê pir paşdamayı lî navçê, dî hêla etnik û ziman da tevi Ewrûpayê ye. Lê Ewrûpa û Koma Miletên Yekbûyi, usa diyare ku qet guh nadîn miletê kurd ku welati wi di navbera Îran, Iraq û Tirkîyê da hatiye parevekirin. Wan, hemû ew gotinên vala ku di peymana pişti şerê cihanê yê yekem da hatine nivisandin ji bir kirine. Ew naxwazin ji tıraje-diya 12'ê Ilonê 1980, hatina cunta leşkeri ser hukum li Tirkîyê û êş û zulma ser kurdan hayedar bin. Dibe ku Kurdistan bibe welatê heri paşin ku di sedsala bistan da bigihije serxwebûnê.

Ev filma giring ya Swêdi, bî bira me tine weki ne pir dûr, lî qeraxên çemê Dicî bist milyon mirov li bendeyê azadiyê û serxwebûnê ne.



Still from the Canadian film OPERA ZERO

World War I. They knew nothing of the tragedy. Not the Kurds either. Just 14,000 armed men had surrendered to Turkey. Perhaps Kurdish independence in the XXth century was a dream. But the Kurdish people were taking place at the same time as the First World War. In 1918. Though I don't like such statements, I must say that the question which pervaded the Kurdish people and themselves in the mind party and themselves in the mind of the Kurdish population? PAZDRO NA MAS. What happened? It seems as if the movie film with the title has re-opened the chapter of nationalism.

ADAM GARBICZ

Vth Show

H included three rather genuine

TEYYARÊ SOFO

Dî bajareki Kurdistana Tîrkiyê da meriveki bî navê Teyarê Sofo hemamciyek hebû. Ser kar-barê xwe dixebiti û gelek ji henekan dikir û ji laqır-diyen ji hez dikir. Yekê reben û bê zîrar bû.

Ew roj ji pêştmal û hewraniyên ter dî hewşa himamê da ser bendan dalıqand û hundır.

Lexzek paşê şili bari. Wi çû hewrani xawliyan topkir ani. Lî nav himamê der dora dalıqan ku zuwa bin. Seetek paşê roj derket, rabû disa bir raxiste ber rojê. Feslabiharê bû û dema baran û şîlîyê bû, her usa ji lî serê ciyan ji dewata gur roviyan bû.

Niv seet nebori bû ku şili disa hat rabû bî kurê xwe va, zûtîrkê tiştên xwe ani hundır.

Lî vê bê taliyê binêrin ku ew roj roja yekşemê bû, gelek xelk vê roja te tilê dihatine himamê. Aliki baran, aliki deng û xwastinêni mirovan nediqediya. Ev rewş heya piştî nivro seet 3'an ajot. Jî ber bîrin û anina pêştmalan ew gelek nerehet bibû. Teyyarê Sofo ji müşteriyek heqê xwe distan nişkêva dengê kurê wi ji deriyê derva hat:

— Bavo! Baran disa tê, him ji zef. Rabe bîlezine em van kambaxa binin.

Teyyarê Sofo êdi tab neda, banzda ber dergê der lî ser şipanderê sekini destê xwe bilind kire ezmin û got:

— Ey xûdêyo! Xûdêyo...! Ev çine tini serê min rebeni. İdi yê te ji ne Kurê min bî kurê tera, qiza min bî qiza tera ley istiyê? Min cûcikê te kuştîye? Ma dujmînahiya min bî te ra heye? Tu ji min çi dîxwazi?

Paşê vege riya ser lawê xwe ku hewraniyan kom dike:

— Lao! İro ma beyna me xûdê lî hev ketiye. Were, were bîla evana derva ji bo wî bîminin û heta nivê şevê baran bîbarine lî ser çika wê çi bibe?

MIZGEVT

Meriveki 50 sali pey lawê xwe yê 10 sali dîbeze û aliki ji dîqire.

— Kuro mereve were vîra, te çîma berxa tenê hiştîye, hati nav gund dîsim simî?

Law dînhêre hêrsa bavê pîr hatiye hin direve. Qasek lî nav gund hev dîgerinin lawîk fîrsend nabine xwe xîlas bîke xwe davêje mîzgevtê. Berderi lavayî bavê dike. Lê qelba bav pîr hatiye, tu tişt dîlê wi nermnake.

Kur dîbêje: Ü ez sos dîdim ku edi berxa tu cari neçimê ciki dîn.

Hêrsa bavê hin zêde tê:

— Kuro, te berxa lî serê çiyan hiştîye hatiye vîra yek ji lavayî min dîki. Ezê te bîkujîm kurê kerê zû derkeve ji mîzgevtê. Tu dîzani heya emrê min heye min tu cara pê nevitiye mîzgevtan. Heke tu dernekevi vê carê ezê we-rim te ji wîra derxinim, dî bin piye xwe da bîparçiqinîn.

JI NAV WEŞANAN

MESELE Ú XEBEROKÊD

CIMAETA KURDA

AZADE

* Pirtuka Prof. Heciyê Cindi ya bî navê "Meselok û Xeberokên Cîmaeta Kurda" li Rewanê hat weşandin. Di nav vê pirtûka 800 rûpelîn da bî hezaran mesele û metelo-kêñ kurdi cih girtine. Ev pirtûka hêja di warê berevkirina zargotina kurdi da bî rasti efrandineke gelek hêjaye.

* Lî ser jinêñ Kurd, rewşa wan, serêşı û problemên wan, ji aliyê Gesa Kêhler û Dorohea Nogga Weinell da, bî zimanê Elmanî pirtûkeke nûh hat weşandin. Nave pirtûkê "Azade" ye.

MAMOSTAYÊ KURD

* Beşa Zanineha Mamosteyêñ Kurd li Swêdê kovareke bî navê "Mamostayê Kurd" çap kur. Di nav rûpelên kovarê da gelek bend, vekolin û lêgerinêñ li ser çand û hunera kurdi cih girtine. Kovar bî zaravêñ kurmanci û sorani du zaravan va derdikeve.

WÊNEKAREKİ KURD

* Riza Topal -ein Kurdischer Maler (wê-nekkareki Kurd) bî vi navi va li Elmanya Federal berevoka wêneyêñ (suret) Riza Topal ji aliyê komeleke kurd da; hat çapkırın. Di nav berevokê da gelek wêneyêñ bî rengin cih girtine.

SERHILDANA KURDAN (1925)

TEVGERA ŞÊX SEİD

KLAMA RÊ

* Beri çend roja, weşanxana "Jina Nû" li ser tevgera Şeyx Seid pirtûkek weşand. Di nav rûpelên pirtûkê da sê lêgerinêñ cu-da-cuda cih girtine. Niviskarêñ van benda Prof. M.A. Hasretyan, Dr. K.M. Ahmet û M. Ciwan e. Pirtûk bî zimanê Tîrki hatiye nivisandin û navê wê "1925 Kürt Ayaklanması - Şeyh Sait Hareketi" ye.

* Pirtûka helbestvanê Sovyet Tosinê Reşit ya bî navê "Kilama Rê" A. Bali wergereandiye zimanê Tîrki, wi wusan ji orjinalê pirtûkê ango kurdiya wê ji pêva kiriye.

DU PIRTÜKÊN NÛ



Bî rasti li ser diroka Kurdistanê, diroka kevn da iro destê me da kêm materiyal hene. Despêka diroka Kurdistanê ji ber vê dijwariyê iro baş nayê zanin. Diyare ku netewek (millet) tenê bî diroka xwe va dikarê biji, diroka neteweke, rûmeta wi netewi nişani me dide. Ji ber van sedaman gelê me iro gelek hewcedari efrandinên dirokiye. Weşanxana Roja Nû giringiya vê hewcadariyê da ber çavê xwe û efrandina CIGERXWIN ya bî navê "Tarixa Kurdistan" cildê yekemin pêşkeşi xwendavanen xwe kir. Ji bo ronahikirina van sedsaliyên kevn, pirtük bersiva gelek pirsan dide. "Tarixa Kurdistanê" wê cild bî cild bê weşandin, paşı vi cildê pêşin cildê duwemin wê bê çapkirin.



Weşanxana Roja Nû efrandineke gelek héja pêşkeşi "Edebiyata Zarokên Kurd" kir, ev efrandina bî navê "Aliko û Baz" angori dinya û femdariya zarakan hatiye nivisandin, bî zimaneki sivik, bî tipê mezin û bî gelek suretên ciwan va hatiye xemilandin. Ev pirtüka delal ji aliyê BARAN da hatiye nivisandin û li Stockholmê çap bûye. Mirov nikare bêje weki ev efrandina tenê ji bo zarakan hatiye amadekirin, ji aliyê din gelek kesên salbuheri ji bî hewaskari dikarin vê pirtûke bixwinin. "Aliko û Baz", ji bo tenê zarakan bîkin xewê, mirov nikare wê wek çirokekê bîhesibine. Dî nav rûpelên "Aliko û Baz" da rojêñ tîrş û tal hene, şer û tekoşin heye, hatina rojêñ baharê, azadiyê û hatina rojêñ xweş heye. Delali, bedewiya tebiyetê, motifên politik, xem-xeyalên rojêñ xweş di vê pirtûkê da xwe gihandiye dinya zarakan.

JI DİROKA ME RÜPELEK

* Wêne ji filmeke dokumenter hatine girtin.



-med Diyarbekir som huvudstad

* Kurd êriş dîbin ser Diyarbekirê

Deras ledares sista ord var:
"Love det frie Kurdistan!"

* Beri ku Şêx Seid û hevalên wi bêñ dardakirin, gotina wan ya dawiyê ev bû: "Biji Kurdistana Azad".

BIHA: 10:- kr.